

Sazûmana Sûriyê sazûmanekî awarte û cudawaz e

Rozad Elî

Partiya Be'is (PB) li sala 1963an textê destlatdariya Sûriyê bi darê zorê wergirt. Dîroka wê li ser destaltê mêlag dike, ku ew di her quncêkî dîroka xwe de cudawaz e, û di şêweya wêrankirina her warekî dewletê û civakê de jî dîsa bê mînak û awarte ye.

PB li 8 î Adara sala 1963an ,bi rêka inqîlabeke leşkerî destlat wergirt, ango bê hîlbijartin, û bi şêweyekî ne rewawarte û bê vîna gelê Sûrî destlat stand.

Pişt re, li sala 1966an hinekan ji rêbertiya PB inqîlabeke li hevalên xwe kirin, û rêbertiyeke nû dîsa bi rêyeke ne destûrî û ne rewawarte li ser textê dewletê danîn. Rola serokê Sûriyê yê berê Hafîz Esed di wê inqîlabê de sereke bû û postê wezaretê berevaniyê wergirt. Û piştî wê bi salekê, di şerê Hezêrana 1967an de, di navbera Ereban û Îsraîlê de, bê ku artêşa Sûrî şerekî berçav bike, ji navçaya Colanê kişî û radestî Îsraîlê kir. Lê belê, li şûna ku wezîrê berevaniyê Hafîz Esed were darizandin yan jî ji ber xwe ve ji ser postê wezaretiyê dagere, ew li ser wezîfa xwe ma, û li sala 1970yî inqîlabeke din rakir û vê carê destê xwe danî ser postê serokmariyê bixwe.

Ji wê salê ve ,şopeke nû li ser bingeha ramana PB hat vekirin, û rêbazeke siyasî û civakî ye cudawaz bi navê (rêberê bav) Hafîz Esed hat ajotin, navnîşana wê bi tevahî, tune kirina îrada gelê Sûriyê bû.

Hafîz Esed ji ba Kurdan de, dest bi cihanîna rêbaza xwe kir. Wî li sala 1973an pirojeya Kembera Erebi ya nijadperest li herêma Cezîrê bicih anî, û piraniya endamên komîta navendî ya Partî Demoqrati Kurd li Sûriyê jî girtin û avêtin zîndanê.

Di warê jiyana siyasî de, û ji ber ku li wê demê Partiya Komonîst û hêzên Nasirî hêzdar û xwedî cemawer bûn, destlatê ji wan de dest pê kir, û ji bo ku wan herhemêz

û paşê jî perçe û bêhêz bike, PB ji wan re de'fa Bereya Niştimanî ya Pêşverû" vena, ew hemî xistin bin rêbertiya xwe, û herwiha di navbera çend salan de, ew partî hemî perçe û lawaz kirin, û PB bû partiya destlatdar û rêber a tek û bi tenê û bê rikber û hemî warên siyasetê, dewletê û civakê jî xistin bin kontrola xwe ya destgiran.

Sazûmana Hafîz Esed li sala 1973an, li gel Misirê kete şerê Tişrînê, lê di encamê de navçaya Colanê venegerand û ra niha jî wisa ye.

Li sala 1976an destlatê û dezgeha serokatiya Hafîz Esed, artêşa Sûriyê derbas Libnanê kirin, û di encama wê destdirêjiyê de ,bi hezaran hemwelatîyên Libnanî û leşkerên Sûrî hatin kuştin, û Libnan bi xwe jî ji hêla rêberên artêşa Sûrî û dezgehên wê yê asayîşê ve wek welatekî dagîrkirî bikar hat, sermiyana wê mêtin û ji her aliyekî ve wêran kirin.

Ji sala 1977an ve û ra sala 1982an, bi behaneya rêbirîna li ber çalakîyên çekdar yê rêxistina "Ixwan Mislimîn", hêzên leşkerî û dezgehên ewlekariyê, kiryarên zor çepel û cudawaz li gelek gund û bajarên Sûriyê kirin, û ew kiryarên çepel bi komkujî bajarê Hemayê bi dawî kirin.

Piştî bûyerên Hemayê û ra roja mirina wî, Hafîz Esed hemî partiyên siyasî yê xwedî bîr û bawerî yekcar pişaftin û jiyana siyasî li Sûriyê ji her aliyekî ve wêran kir.

Bitevahî, di dema destlatdariya Hafîz Esed de, guh, çav û devê mirovê Sûrî hatin bêkarkirin, û civata Sûrî jî bû dareke hişk, bê ber, bê giyan, bê aso û bê hêvî. Ji aliyê dezgeh, sazî û îdareyên dewletê ve jî, gendelî, bertîl, rotîn û her tiştê ku zîyanê digihîne jiyana rojane ya mirovê Sûrî û wî li şûn dihêle, gihîştin radeyên pir zîyanbar û bilind. Di vê rewşê de, saziyên ewlehiyê pir bûn, mezin bûn, bûn destlatên rastfîkî di her war û mofirkeke dewletê de, wan

D.R.(10)